

Aşartin û înkarkirin

Ey bavê min, ez bi te re me ku ez nakevim bin hukma tirsê, belem kurê hezkirina te. Ez xwe ji hemî daxwazên Îslamê yên ku Mihemedî fêr kirine, bêguneh dikim. Ez hemî şêwazên radestbûna xwedê yên di Quranê de, înkâr dikim, û radigihînim ku ez xulamê tenê Ellahê bavê xwedayê me Îsayê Mesîhî me.

Ji ber şaşî û gunehên bapîrên me yên ku ketibûn bin hukma zumiyetê, tobe dikim û bexişîna te ji gunehên wan re dixwazin.

Hemî mafên ku ji peymanên radestbûnê yên ku ji muslimanan an ji Îslametiye re hatine dayîn, derketine, înkâr û betal dikim, çi yên ku min ji xwe re danîne, çi jî yên ku bapîrên min ji ber min ve danîne.

Ez bi temamî pergala zumiyetê û hemî mercên wê red dikim

Ez mafê ku ji ber lêdana qirikê ya ku di rewşa dayîna ciziyeyê de tê pêkanîn derketiye, û hertiştê girêdayî wî, înkâr dikim. Bi taybetî jî ez xwe ji nefreta serjêkirin û mirinê yên ku nûnertiya vê rewşê dikin, bêguneh dikim.

Ez radigihînim ku peymana zumiyetê bi çarmixa Mesîhî ve hate girêdan. Peymana zumiyetê eşkere bû, ti desthilatîne wî û mafên wî li ser min tine ne. Ez radigihînim ku rastiya bingehe n peymana zumiyetê ya giyanî xuya bû, û t êk çû, û li ser çarmixê hate birîn.

Ez hestên memnûniya ji Îslamê re yên sexte înkâr dikim.

Ez xwe ji hestên bigunehiyê yên sexte înkâr dikim.

Ez xapandin û derewkirinê înkâr dikim.

Ez xwe ji her hevpeymanekê ku ez bêdeng kirim daku ez li ser peymana zumiyetê yan li ser Îslamê neaxivim, înkâr dikim.

Ez ê bibêjim û bêdeng nemînim.

Ez radigihînim ku "rastî min azad dike" (Yûhena8: 32) û jiyana azad di Îsayê Mesîh de hildibijêrim.

Ez hemî nefretên ku li dijî min û malbata min bi navê Îslamê hatine kirin, înkâr dikim. Ez hemî nefretên ku li dijî bav û pêşiyên min hatine kirin, înkâr dikim.

Bi taybetî ez nefreta mirinê dişikînim û înkâr dikim. Ey mirin, êdî ti desthilatiya te li ser min tine ye!

Ez radigihînim ku êdî desthilatiya van nefretan li ser min tine ye.

Ez li gor mîrata xwe ya giyanî, mafê xwe di bereketa Mesîhî de dixwazim.

Ez tirsandin û metirsîdanê înkâr dikim. Ez hildibijêrim ku bicesaret bim di Îsayê Mesîh de.

Ez lîstina bi xelkê, bi peyvan yan bi zordariyê înkâr dikim.

Ez xwe ji tadekirin û hovîtihê bêguneh dikim.

Ez her rastiyeke ku li min bitirs e, înkâr dikim. Ez tirsî ji nepejirandina min ji aliyê xelkê ve înkâr dikim. Ez xwe ji tirsî ji destjêberdana pere û milkên xwe bêguneh dikim. Ez tirsî ji hejariyê înkâr dikim. Ez tirsî ji koledariyê înkâr dikim. Ez tirsî ji tadekirinên cinsî înkâr dikim. Ez tirsî ji dûrkirina min ji aliyê civakê ve înkâr dikim. Ez tirsî ji windakirina malbata xwe înkâr dikim. Ez tirsî ji ku werim kuştin înkâr dikim û tirsî ji mirinê înkâr dikim.

Ez tirsî ji Îslametiye înkâr dikim. Ez tirsî ji muslimanan înkâr dikim.

Ez tirsî ji kirina karên siyasî înkâr dikim.

Ez radigihînim ku Îsayê Mesîh xwedayê li ser hemîyan e.

Ez xwe radestî Îsayê Mesîhî dikim û her aliyên jiyana xwe dispêrim wî. Îsayê Mesîh xwedayê mala min e. Îsayê Mesîh xwedayê bajarê min e. Îsayê Mesîh xwedayê gelê min e. Îsayê Mesîh xwedayê hemî gelên vê cîhanê ye. Ez xwe radestî xwedayê xwe Îsayê Mesîhî dikim.

Ez heqaretkirin û biçûkxistinê înkâr dikim. Ê radigihînim ku Mesîhî ez pejirandime. Tenê ez ê xizmeta wî bikim.

Ez şermiyê înkâr dikim. Ez radigihînim ku çarmix ez ji her gunehê paqij kirim. Ti mafên şermiyê li ser min tine ne, û ez ê Mesîhî bilind bikim.

Ey xwedê, ji min û bapîrên min re her gunehê ku bi muslimanan re kiriye, bibexîşîne. Ez xwe ji hezîkirinê bêguneh dikim, çî li bi muslimanan re be, çî jî bi kesekî din re be, ez radigihînim ku hezîkirina Mesîhî ji hemî muslimanan re û ji hemî xelkê re li her derekê li cîhanê ye.

Ez ji ber gunehên dêrê û ji ber radestbûna şaş a ku rêberên dêrê kiriye ve, tobe dikim.

Ez dûrbûna ji kesên din înkâr dikim, radigihînim ku xwedê ez bexîşandim û di Mesîhî de pejirandim. Ez û xwedê li hev hatin. Ti hêzên erdê û asîmanê tine ne ku li hizûra xwedê li min gilî bikin.

Ez spasdariya xwe ji xwedayê xwe re, bavê xwe re, ji xelaskerê min ê yekane Mesîhî re, ji giyana pîroz a ku tenê ew jiyane dide min re, pêşkêş dikim.

Ez xwe ji bo şahidtiya Îsayê Mesîhî dispêrim. Ji ber çarmixa wî fedî nakim. Ê ji ber qiyameta wî fedî nakim.

Ez radigihînim ku ez kurê xwedê yê zindî me, xwedayê Îbrahîmî û Îshaqî û Y'eqûbî.

Ez serkeftina xwedê û Mesîhê wî radigihînim. Û teqez dikim ku her ziman dê biaşêre ku Îsayê Mesîh xwedayek ê Ellahê bav e.

Ez bexişîna xwe ji muslimanan re ji ber beşdarbûna wan di pergala zumiyetê de, radigihînim.

Ey bavê asîmanî, min ji pergala zumiyetê û ji rihê zumiyetê û ji her bingehên nepîroz ên di peymanana zumiyetê de, azad bike.

Niha jî ez dixwazim ku tu min bi giyana xwe ya pîroz tijî bikî, û hemî bereketa komara Îsayê Mesîhî bi ser min de birijîne. Nî'imetekê bide min daku ez rastiyê bi zelalî di gotina te de nas bikim, û wê di her milekî ji milên jiyana xwe de pêk bînim. Peyvên hêviyê û jiyane bixe devê min, wek te soz dabû, lêvên min pîroz bike daku ez bi rastiyê bi yê din re biaxivim, bi desthilatî û hêz, di navê Mesîhî de. Hêzê û cesaretê bide min daku ez bibim şahidekî pêbawer ji Mesîhî re. Hezkirineke kûr ji muslimanan re bide min, û dilekî ku hezkirina Mesîhî bi wan re parve bike, bide min.

Ez van tiştan hemiyar di navê Îsayê Mesîhî, xweda û xelaskerê min de, radigihînim û dixwazim. Amîn.